Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :836 07-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî , Civakî û Çandî

# Hêzên Ewlekariya Hundir bîlançoya xebata xwe ya meha Çile eşkere kir

## KONGRA GEL: Rêber Apo konsepta komployê pûç kir û têkoşîna xwe li seranserê cîhanê belav kir



***KONGRA GEL têkildarî komploya li dijî rêber Abdullah Ocalan daxuyaniyek da û wiha got: "Xwestin bi dîlgirtina rêber Apo Tevgera Azadiyê têk bibin û pergala xwe ya li Kurdistanê û li Rojhilata Navî bidomînin. Lêbelê rêber Apo bi berxwedana xwe, konsepta komployê pûç kir û bi 'Paradîgmaya Azadiyê' jî têkoşîna xwe li seranserê cîhanê belav kir."***

Dîwana Hevserokatiyê ya KONGRA GEL, bi pêmana salvegera 22'yan ya komploya navneteweyî ya 15'ê Sibata 1999'an ya li dijî rêber Abdullah Ocalan, daxuyaniyek weşand.
Di destpêka daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Em di 22'ê salvegera kompoloya navneteweyî de hêzên komploger şermezar dikin. Hêzên komploger ji niha ve di rûpelên reş yên dîroka mirovayiya pêşketî de cihê xwe girtin."
Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku hêzên komploger ji bo berjewendiyên dewletên xwe, di şexsê rêber Abdullah Ocalan de xwestin têkoşîna azadiyê ya gelên Kurdistanê bikin qurban.
Di berdewmam daaxuyaniyê de wiha hat gotin:
"Bi pêşengiya Brîtanya bi destê hin welatên Ewropa di şerê cîhanê ya 1'ê de Kurdistan hat parçekirin û li Rojhilata Navî bêheq û bêstatû, di dorpêça komkujiyê de teslîmê çar dewletên dagîrker kirin. Gelê Kurdistanê ji bo azadiya xwe li hemberî dagîrkeran gelek caran serî hilda. Lêbelê welatên Ewropa nexwestin ew statûya şerê cîhanê ya 1ê bê guhertin.
Li hemberî vê siyaseta dewletên kapîtalîst û emperyal û dewletên dagîrker yên li Kurdistanê, bi pêşengiya Rêber Apo gelên Kurdistanê di her beşa jiyanê de xwe birêxistin kirin û dorpêça komkujiyê şkandin û li ser vî bingehê jî li Rojhilata Navî hevsengiyeke nû ava kirin.
Ji ber wê Rêber Apo bi komployeke navneteweyî bû hedefa hêzên kapîtalîst û emperyal. Xwestin bi dîlgirtina Rêber Apo Tevgera Azadiyê têk bibin û pergala xwe ya li Kurdistanê û li Rojhilata Navî bidomînin. Lêbelê Rêber Apo bi berxwedana xwe, konsepta komployê pûç kir û bi 'Paradîgmaya Azadiyê' jî tekoşîna xwe li hemû cîhanê belav kir.
Em di tekoşîna li dijî kompoloya nawneteweyî ya sala 23'yan de, ji gelên Kurdistanê û dostên xwe re serketinê dixwazin."

## Li rojhilatê Dêrezorê nexweşiya laşmanya ji sedî 77 kêm bûye



Komîteya Tenduristiyê ya rojhilatê Dêrezorê dermanê laşmanya, li welatiyên bi vê nexweşiyê ketîn belav kir. Piştî belavkirina derman ji sedî 77 nexweşî kêm bû.

Li rojhilatê Dêrezorê piştî derxistina QSD`ê ji herêmê, welatî vegeriyan malên xwe. Lê bi vegerê re, nexweşiya bi navê laşmanya jî ya bi "Heba Helebê" tê nasîn, li herêmê belav bû.
Welatiyên rojhilatê Dêrezorê, digel tinebûna derfetên tenduristiyê êşa zêdebûna laşmanya kişandin. Lê bi belavkirina dermanê Komîteya Tenduristiyê ya rojhilatê Dêrezorê li welatiyan belav kirî, jimara kesên bi laşmanya dikevin, kêm bû.
Rêvebera komîteye tenduristiyê Meryem Ewêd ev agahî dan: "Piştî vegera welatiyan, me dest bi hemleya belavkirina dermanê laşmanya kir. Me Sibata 2020 an serjimariya kesên bi laşmanya ketîn çêkir. Jimara kesên pê ketîn, ji Hecînê heta Baxozê 18 hezar bû. Piştî belavkirina derman jimar pir kêm bûye û niha 4 hezar nexweş man.
Rêvebera komîteya Teduristiyê Meryem Ewêd axaftina xwe wiha qedand: "Nexweşî di dema vegera welatiyan de belav bû. Bi taybetî li Hecîn û Baxozê. Çimkî her du herêm hatibûn roxandin û gelek gelaş lê kom bûbû. Ji bo wê me dest bi hemleya xweparastinê kir."





**Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê banga parastina yekîtiya xwîn gelên Sûriyê, bidawîkirina rewşa aloz ku hêzên hikumeta Şamê derxistiye û parastina yekîtiya xaka Sûriyê kir.**

Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bi civîneke çapemeniyê li bajarokê Rimêlan yê girêdayî kantona Qamişlo, bîlançoya xebata xwe ya Çileya 2021`ê eşkere kir.
Berdevkê Fermî yê Hêzên Ewlekariya Hundir Elî El-Hesen bi zimanê erebî û endama rêveberiya Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê Rîhan Mihemed bi zimanê kurdî, dauxyanî xwendin.
Daxuyanî wiha ye:
"Wekî tê dîtin ku piraniya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê yên li eniyên şer yên bi çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker re, rojane rastî êrişan tên, binesaziya bajaran di hedefa êrişan de ne û xelkê wan herêman neçar dikin ku mal, gund û bajarên xwe terk bikin.
Hemwextî wê DAIŞ rêzeçalakiyên terorîst bênavber didomîne. Bi taybetî li kampa Holê, gundewarê Dêrazorê û çolistana Sûriyê. Diyar e ku armanca sereke ya êrişên çeteyên dewleta tirkî ew e ku DAIŞ careke din nefesê bistîne û xwe komî ser hev bike.
Di demên dawî de rejima Sûriyê li bajarê Qamişlo û Hesekê hewl dide rewşeke aloz derxe, ku aramî û ewleyiya li herêmê têk bibe û di navbera gelan de tevlîheviyê derxe.
Wekî Hêzên Ewlekariya Hundir em girêdayî yekbûna xwîna gelê Sûriyê ne û em kar dikin ku vê aloziya ku rêjima Sûriyê derxistiye bi dawî bikin. Herwiha em yekbûna xak û gelê Sûriyê diparêzin. Her wiha emê derfetê bidin ku alîkarî derbasî cihên rejimê yên li bajarê Qamişlo û Hesekê, bibe.

### BÎLANÇOYA MEHÊ

10 dewreyên cihêreng hatin birêxistinkirin, tê de 693 endaman perwerde dît.
Tîmên endeziyariya mayînan 23 mayîn bêbandor kirin. Li seranserê herêmê 25 teqîn çêbûn, di encamê de 12 sivîl şehîd bûn û 21 sivîl birîndar bûn.
Hêzên me bi hevkariya bi Koalîsyona Navneteweyî li dijî şaneyên veşartî yên terorîst 7 opersyonên hevbeş pêk anîn.
Di berdewamiya pêngava "Jiyan berpirsiyarî ye" ya li dijî madeyên hişbiriyê, hêzên me 225 sûcdarên bazirganî û belavkirina madeyên hişbiriyê girtin. 143 dosyayên madeyên hişbiriyê radest kirin, di heman demê de 5 şaneyên bazirganî û qaçaxçiya şûnewaran bê bandor kirin û dane girtin.
13 tawanên kuştinê hatin eşkerkirin, di heman demê de 4 hewldanên kuştinê pêk hatin.
6 tawanên sextekirina pereyan û 21 tawanên sextekirina belgeyên fermî hatin eşkerekirin.
Girêdayî dosyayên dizîyê, 106 bûyerên diziyê û 14 tawanên bikaranîna nasnameya kesekî hatin tesbîtkirin. 14 dosyayên fêlbazî û 25 dosyayên derbaskirina edeb û dispilîna civakê, hatin eşkerekirin.

### REWŞÊN AWARTE:

Rewşên ku hatin pêşwazîkirin bi giştî 713 in, ji wan 410 rewşên sar û 303 rewşên germ. Di heman demê de ji bo 4 qezayên trafîkê û 3 bûyerên şewatê destwerdana lezgîn kirin.

### HÊZÊN HAWARÎ:

Hêzên Hawarî di 23 rewşan de, 3 teqîn û 87 qezayên trafîkê destwerdana lezgîn kirin.

### POLÎSÊN TRAFÎKÊ:

Di vê mehê de civîna sala 2020`î ya Polîsêln Trafîkê hate lidarxistin. 3 hezar û 275 kesan ji bo destûra ajotinê qeyda xwe çêkirin.

### EWLEKARIYA BENDÊN KONTIROLÊ Û RÊYAN:

Bendên me yên kontrolê 124 çekên neruxstkirî desteser kirin.
Hijmarek hewldanên qaçaxçiyê bê bandor kirin ku tê de hezar û 520 lître benzîn, 26 hezar û 940 lître mazot û 68 ton ceh desteser kirin.
Rewşên qeza, şewat û nelihevkirinên li ser rêyan ku bi rêya kamîreyên çavdêriyê hatin dîtin û mudaxlekirin, 28 rewş in.
Odeyên opersyonê bi rêya xetên peywendiya germ 737 gilî pêşwazî kirin.
Her wiha 3 hezar û 289 girtî radestî komîteya lêpirsîn û dozgeriyê hatin kirin, 2 hezar û 81 girtî serbest hatin berdan.

### HÊZÊN EWLEKARIYA HUNDIRÎN-JIN:

45 endaman perwerdeyên pisporî û fikirî dîtin. Di heman demê de hêzên jin di vê mehê de li ser 3 dosyayên diziyê, dosyayeke kuştinê, 2 dosyayên fihûşê û dosyayeke fîlbaziyê kar kirin. Di hemû dosyayên borî de jin sûcdar bûn. Dosyên ku sûc li jinê hatiya kirin jî ev in; 7 dosyayên kuştinê û 3 hewldanên xwekuştinê. Hijmara jinên sûcdar ên ku hatine girtin 190 e, ji wan 115 serbest hatin berdan.
Wekî Hêzên Ewlekariya Hundirîn û ji destpêka avakirina hêza xwe ve û heta niha me soz daye ku kar û erkên xwe bi zelalî û bi hemû hêza xwe bikin xizmete ewlehî û ewlekariya hemwelatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Em soz didin ku em ê destkeftiyên bi xwîna şehîdan hatine bidestxistin, biparêzin û li ser xet û soza şehîdên xwe bin ên ku nexşeya jiyana azad û bi rûmet ji bo me xêz kirine."

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Bajarok** | **Bajarê piçûk. 2. Ji gundan mezintir ji navçeyan piçûktir.** |
| Cangorî | 1. Xweşmir, pakrewan, canfeda, xwbexş. 2. Kesê ji bo dozekê jiyana xwe dike gorî, fedayî. |
| Çalakvan | Kesê çalakiyan dike, çalakker. |
| Gef | Gotina ji bo tirsandinê, reşdayîn, tehdîd: Rêbiran gef li gundiyan xwarin. |
| Navçe. | Ji bajêr piçûktir, ji bajarok mezintir. |
| Qad | Meydan, ciyê mezin û fireh: Ji bo şermezarkirina dagîrkeran welatî daketin qadan. |
| Xwepêşandan | Komek mirov ku ji bo şermezarkirina tiştekî li ciyekî helwesta xwe diyar dikin. Xwenîşandan: Ji bo dijberiya li hemberê bihabûna benzînê welatiyan xwepêşandanek li dar xist. |
| Xweşmir | Şehîd, pakrewan. |
| Çalakî | Bizav, xebat, liv, lebat, tevger, hereket, kiryar, kar, kirin: Ji bo bîranîna şehîdan çalakiyek hat lidarxistin. |
| çalak | Çeleng, jîr, jêhatî, xurt, kêrhatî: Xortên gundê me çalak in. |

## Qedexeya derketina derve bi dawî bû

***Rêveberiya Xweser*** ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya giştî û qismî ya ji bo pêşîgirtina li korona ragihandî, rakir.***R-2***




## 'Komploya Navneteweyî li dijî gelên berxwedêr bû'



Endama Kongreya Star Selwa Ehmed diyar kir ku Komploya Navneteweyî ne li dijî kesayeta rêber Abdullah Ocalan yan gelê Kurd tene bû, di heman demê de li dijî tevayiya gelên li hemberî faşîzma dewleta têdikoşin bû. ***R-2***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 836 07-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî , Civakî û Çandî

## Kongreya Star dest bi hemleya komkirina imzeyan kir



***Kongreya Star*** li herêma Efrînê ji bo darizandina serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan, hemleya komkirina imzeyan da destpêkirin.
***R-3***

# Ronahî Tv li Hewlêrê çima qedexe ye?



Yek ji mafên mirovan yên herî sereke mafê xwegihandina agahiyan e. Lê mixabin ev maf bi taybetî li Rojhilata Navî her tim tê binpêkirin û civak ji vî mafê xwe bêpar dimînin. Rêveberiya başûrê Kurdistanê jî vê rêbaza desthilatên Rojhilata Navî bi dilxwazî dişopîne. Mînaka wê ya berbiçav jî destûrnedayîna Ronahî Tv. ye. ***R-2***




## Cemîl Bayik: Divê ti kes nebe şirîkê qirkirinê



Hevserokê Konseya Rêveber ya KCK'ê Cemîl Bayik got, divê ti kes nebe şirîkê qirkirinê, xizmeta siyaseta Erdogan û Bahçelî neke û qirkirina gelê Kurd pêş nexe. ***R-4***

## 3 sendîkayên Îtalya jî piştgirî dan kampanya 'Ji Ocalan re azadî'




Sendîkayên Îtalya COBAS, CUB û UNICOBAS jî tevlî kampanya 'Ji Ocalan re azadî' bûn û ji Neteweyên Yekbûyî re name şandin. ***R-5***

## Berxwedana li zindanan 73 roj in didome



Çalakiya greva birçîbûnê ya girtiyên siyasî yên li girtîgehên Tirkiyê û bakurê Kurdistanê li dijî tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan dest pê kirîn, di roja 73yan de dewam dike. ***R-2***

# Qedexeya derketina derve bi dawî bû

## Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya giştî û qismî ya ji bo pêşîgirtina li korona ragihandî, rakir.

Rêveberiya Xweser di biryara 27. de, ku roja Çarşemê di malpera xwe ya fermî de weşandibû, ev agahî dan:
Li gorî berjewandiyên giştî, Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya bakur û rojhilatê Sûriyê, radighîne;
1-Hemû biryarên ku ji aliyê Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya bakur û rojhilatê Sûriyê ve têkildarî qedexeya giştî û qismî ya ji bo korona (Covid,19) hatibûn girtin, tên rawestandin. Ev biryar 4/2/2021'ê dest pê dike.
2- Ev biryar wê ji hêla her kesî ve were pêkanîn.
Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, cara yekê qedexeya derketinê li herêmên xwe 23'yê Adara sala 2020'an, ragihandibû.

## Cenazeyê şehîd Iwênat li Minbicê hat veşartin



Bi sedan şêniyên bajarê Minbicê cenazeyê endamê Lîwa El-Şemal El-Demokratî şehîd Samih Iwênat li goristana Şehîdan spartin axê.
Welatiyan bi alên Lîwa El-Şemal El-Demokratî, Meclisa Malbatên Şehîdan û Tevgera Ciwanên Şoreşger cenazeyê endamê Lîwa El-Şemal El-Demokratî Samih Iwênat, ji pêşiya nexweşxaneya Firatê girtin û bi kerwanekî ber bi goristana Şehîdan ve çûn.
Di merasima li goristanê de piştî rêzgirtinê, berdevkê Fermî yê Lîwa El-Şemal El-Demokratî Mehmûd Hebîb axivî û got, bi berdêlên giranbiha em welatê xwe diparêzin. Bi yekîtî û hevgirtinê em li dijî tundrew û terorîstan disekinin da ku ref lawaz nebe."
Bi navê Meclisa Malbatên Şehîdan Hevserokê Nivîsgeha Malbatên Şehîdan Rebî Izedîn jî got, gelên me berdêl dan, ji bo ewleyî û aştiyê canê xwe feda kirin û em fêrî jiyana birûmet.
Dû re endama Meclisa Malbatên Şehîdan Cemîla Îbrahîm nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê kir. Şehîd di nava sloganan de hat spartin.

## Li Bakur û rojhilatê Sûriyê jimara nexweşên korona kêm dibe

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ragihand ku 7 kes bi vîrûsa korona (Covid-19) ketine.
Li gorî hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê Dr. Ciwan Mistefa, kesên bi vîrûsa korona ketîn, 3 mêr, 4 jin in û li van herêman in: Hesekê: 1. Til Temir: 1. Dêrik: 1. Reqa: 1. Tebqa: 1. Dêrezor: 2
Herwiha hat ragihandin ku 2 kesên




bi korona ketîn jî baş bûne.
Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê heta niha 8 hezar û 523 kes bi korona ketine. Ji wan 296 kesan jiyana xwe ji dest daye, hezar û 218 kes jî baş bûne.

## Berxwedana li zindanan 73 roj in didome

Çalakiya greva birçîbûnê ya girtiyên siyasî yên li girtîgehên Tirkiyê û bakurê Kurdistanê li dijî tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan dest pê kirîn, di roja 73yan de dewam dike.
FacebookTwitterWhatsAppTelegram
Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê 27'ê Mijdara 2020'an, ji bo rakirina tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan ku 21 sal in li Girtîgeha Tîpa



F ya Îmralî girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan yên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin.
Çalakiya girtiyên siyasî ku koma 15an dewr girtiye, di roja 73`yan de didome.

## Dagîrkeran li gundên Til Temir gelek mal şewitandin

Leşkerên artêşa tirkî ya dagîrker li gundê Qasimiyê yê Til Temir agir bi gelek malan xistin.

Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê, sûcên xwe yên li herêmên dagîrkirî didomînin.
Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên girêdayî wê, li gundê Qasimiyê yê dagîrkirî yê 6 km dikeve bakurê rojavayê navçeya Til Temir, gelek mal şewitandin.




Li gorî agahiyên çavkaniyan dayîn ANHA, gundê Qasimiyê ji ber dizî, talankirin û wêrankirinê ku ji aliyê dagîrkeran ve tên kirin, wêran bûye.

## 'Komploya Navneteweyî li dijî gelên berxwedêr bû'



Endama Kongreya Star Selwa Ehmed diyar kir ku Komploya Navneteweyî ne li dijî kesayeta rêber Abdullah Ocalan yan gelê Kurd tene bû, di heman demê de li dijî tevayiya gelên li hemberî faşîzma dewleta têdikoşin bû.

Kongreya Star di nava rêzçalakiyên xwe yên li navçeyên kantona Hesekê de, li ser Komploya Navneteweyî ya li diji rêber Abdullah Ocalan, li bajarokê Til Tewîl yê girêdayî bajarê Hesekê semînerek li dar xist.
Endama Komîteya Perwerdeyê ya Kongreya Star Selwa Ehmed, bi beşdarbûna bi dehan şênî û endamên saziyên sîvîl di semînerê de wiha axivî: "Armanca komploya li dijî kesayeta rêber Abdullah Ocalan, li dijî tevayiya gelên azadîxwaz bû."
Selwa Ehmed diyar kir ku komplo ne li dijî kesayeta rêber Abdullah Ocalan yan gelê Kurd tene bû, di heman demê de li dijî tevayiya gelên li hemberî zêhniyeta dewleta tirkî ya dagîrker têdikoşin bû.
Selwa herwiha da zanîn ku rêber Abdullah Ocalan bi fikir û felsefeya xwe ti carî zor û zilm qebûl nekir.

## RonahîTV: Hikumeta başûrê Kurdistanê rê nade em bûroya xwe li herêmê vekin

Rêveberiya Ronahî TV bi daxuyaniyekê diyar kir ku serî li aliyên pêwendîdar yên hikumeta başûrê Kurdistanê dane da bûroyeke xwe li herêmê vekin, lê asayişa hikumeta Başûr serlêdana wan bêbersiv hiştiye.
Rêveberiya Ronahî TV di daxuyaniya xwe de wiha got:
"Ji destpêka meha Cotmeha 2020'an ve, Ronahî TV bi riya nûnertiya xwe ya resen ya ku paytexta Swêdê Stocholmê weke navendeke sereke jê re ye, daxwaznameyeke fermî û li gorî prensîb û qanûnên ragihandinê şand ji aliyên peywendîdar yên hikumeta başûrê Kurdistanê re. Tê de daxwazî kir ku bûroyeke Ronahî TV li paytexta herêma başûrê Kurdistanê Hewlêrê were vekirin da ku bikare bi awayekî hêsan û li gorî qanûn û prensîbên ragihandinê karê xwe bike. Lê mixabin bi behaneya ku Komîteya Pêwendîdar ji ber vîrûsa korona neciviyaye, Hêzên Asayişê li Hewlêrê ew daxwazname li cem xwe hiştiye û erêkirina ewleyî nedaye û heta kêliya nivîsandina vê daxuyaniyê ew daxwazî hê bêbersiv maye û me tu destûr ji bo meşandina karê xwe yê ragihandinê li başûrê Kurdistanê bi dest nexistine. Tevî ku desthilata hikumeta Iraqê erê kiriye û ji bo rêkarên fermî me serî li Desteya Rewşenbîran ya herêma başûrê Kurdistanê daye û li gorî formalîteya başûrê Kurdistanê belgeyên pêwîst ji saziyên peywendîdar hatine xwestin.
Li ser vî bingehî belge dema çû ber destê Asayişê, heta niha nehatiye erêkirin û ti bersiv nehatine dayîn. Em dibînin ku tiştên Asayişa başûrê Kurdistanê derbarê pêkneanîna civîna Komîteya Pêwendîdar de gotiye, behane ye. Di heman demê de em vê helwestê di cih de nabînin û dixin rêza binpêkirina mafê azadiya ragihandinê û pêkanîna fişarê li ser dezgehên ragihandinê."



# Hunermend Mihemed Elî Şakir di çilrojiya wefata wî de hat bîranîn

## Hunermend û helbestvan Mihemed Elî Şakir di çilrojiya wefata wî de li bajarê Qamişlo hat bîranîn.

Bi pêmana çilrojiya wefata hunermend û helbestvanê Kurd Mihemed Elî Şakir, Desteya Çand û Hunerê ya Herêma Cizîrê li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo merasimek li dar xist.
Malbata hunermend, gelek hunermend, rewşenbîr, nûnerên saziyên Rêveberiya Xweser û şêniyên bajarê Qamişlo di merasima bîranînê de amade bûn.
Piştî deqeya rêzgirtinê, hevserokê Meclisa Rêveber ya Herêma Cizîrê Tehet Yûnis, sersaxî ji malbata hunermend û hevalên wî re xwest. Herwiha behsa xebata wî ya hunerî kir û wiha got: "Xebat û têkoşîna hunermend Mihemed Elî Şakir cihê serfiraziyê ye, lewre jiyana xwe xist xizmeta vejandin û parastina çand û hunera kurdî û bi berhemên xwe bû dengê gelê xwe."
Telet Yûnis diyar kir ku erkê her rewşenbîr û hunermendî ye ku xeta hunermend Mihemed Elî Şakir bişopîne û destkeftiyên şoreşa Rojava biparêze.
Endamê komîteya amadekar ya merasimê Aram Cewad jî got, wesiyeta nemir Mihemed Elî Şakir parastina welat û pêkanîna yekîtiya kurdî bû."
Birayê hunermend, Mihemed Ezîz Şakir jî spasiya saziya ku merasima bîranînê li dar xisî kir û got, dirêjayiya 50 salî min û birayê xwe bi hev re kar kir û çûyîna wî barê min giran kir."
Keça hunermend, Şîrîn Mihemed Şakir di bîranînê de axivî û got, ez bi bavê xwe û xebata wî serbilind im."
Piştî axaftinan belgefîlmeke li ser jiyana hunermend Mihemed Elî Şakir hat nîşandan.
Hevrê Şakir û Deham Ebdulhemîd behsa hevaltiya xwe û nemir û xebata wî kirin.
Pişt re, helbestvan Anahîta Sîno helbest xwendin.
Di dawiyê de, hunermend Çîmen Hesen, Îmad Xelef, Sefqan Orkêş, Zoro Seyîd Yûsif û Mizgîn Tahir stiranên Mihemed Elî Şakir gotin.




## 'Helbest deryayeke bêdawî ye'

*Sorgul Şêxo/JINNEWS*

Nalîn Memdûh Yûnis ya ji zaroktiya xwe ve bi heskirina nivîsa helbestan mezin bûyî, têkildarî helbestên dinivîse da zanîn ku helbest ji bo wê deryayeke bêdawî ye û wiha got: "Helbest diyarkirina hestên mirovan e. Ez di helbestên xwe de pirtir berxwedana şervan, jin, zarok û xwendekaran ya li hemberî dagîrkeran, vedibêjim. Ez her tim peyama berxwedanê didim pêş."
Piştî Şoreşa rojavayê Kurdistanê jinan di qada wêje, çand û hunerê de xebata xwe pêş xist. Jinên nikaribûn bi zimanê xwe binivîsin piştî şoreşê êdî bi rehetî wêjeya xwe û hunera xwe bi zimanê xwe honandin. Nalîn Memdûh Yûnis ya 18 salî ya ji navçeya Til Temir ya Kantona Hesekê, yek ji wan jinan e ku di qada hunerê de xwe pêş xistiye. Nalîn ji zarokatiya xwe ve bi heskirina nivîsandin û xwendina helbestan, mezin bûye. Nalîn ku refa 10'an ya dibistana amadeyiyê dixwîne, li kêleka wê jî dema xwe bi nivîsandina helbestan derbas dike. Nalîn di gelek şahiyên ku tevlî dibe de, helbestên ku nivîsandine dixwîne û bi vê yekê bala şêniyên navçeya Til Temir tevan dikişîne. Nalîn têkildarî nivîsandina helbestê axivî.

**'Ez bi heskirina nivîsandina helbestê mezin bûm'**

Nalînê di destpêkê de behsa zarokatiya xwe û heskirina xwendina helbestê kir û wiha got: "Ji zarokatiyê ve heskirineke min pir zêde ji helbestê re hebû û min dixwest ku bibim helbestvan. Ji 9 saliya xwe ve dema ku ez li refa 3. bûm, min helbest dixwendin û ji ber dikirin. Heta 12 saliya xwe min bi vî rengî dewam kir. Paşê ez fikirîm û min biryar da ku ez helbestan binivîsim û berhemên min yên taybet hebin. Min dîmen kom dikirin û li gorî wate û rêbazê



wan helbestan, min helbestên taybet çêdikirin. Helbesta ku di destpêkê de min nivîsandî bi navê Bakur, Başûr û Rojhilat bû. Di vê helbestê de min xwest ku berxwedana lehengên têkoşerên Kurdistanê, bidim diyarkirin."

**'Hinek helbestên min hê bi dawî nebûne'**

Nalînê bal kişand ser kêliyên nivîsandina helbestê û wiha pê de çû: "Pêwîst e di bêdengî, tenêbûn û li ber mûzîkeke nizim bim, da ku ez bikarim helbestên xwe binivîsim. Carna jî di meşa li kolanê de yan jî ku ez karekî dikim, peyv tên bîra min. Wê demê eger ez wê peyvê nenivîsînim ji bîra min diçe. Carna jî ez saetekê ji xwe re vediqetînim û dihizirim. Dema ku mirov dikeve nava xeyalan û dihizire, dikare helbestê binivîse. Herwiha dema ku ez helbestê dinivisînim, pêwîst e ku ez xwe bikim şûna kesên şehîd, koçber an jî welat. Bi vî rengî ez ilhamê digirim û gotinên pir bedew tên afirandin. Yên ne xwedî hestên nazik bin, gotin ji dil dernayên û helbest nayê honandin. Hinek berhemên min ên derbarê Şoreşa rojavayê Kurdistanê de ku jinê pêşengiya wê kiriye hene, lê hê bi dawî nebûne."

**'Helbest deryayeke bêdawî ye'**

Nalînê da zanîn ku helbest pir kûr in, yên ku bikeve hundirê hestên wê winda dibe û wiha domand: "Mirov dikare ji helbestekê çar rûpelan binivîse, lê hinek helbest hene çiqasî kin û naveroka wan dagirtî be ewqasî hêsan e ku mirov bixwîne û jê sûdê bigire. Helbest deryayeke bêdawî ye, yê ku bikeve kûrayiya wê bêguman wê winda bibe. Helbest diyarkirina hestên mirovan e. Ez di helbestên xwe de pirtir berxwedana şervan, jin, zarok û xwendekaran a li hemberî dagîrkeran, vedibêjim. Ez her tim peyama berxwedanê didim pêş."

**'Min li ser Waşokaniyê helbest nivîsand'**

Nalînê piştî dagîrkirina Serê Kaniyê helbesta bi navê Waşokanî nivîsand û wiha ji me re behsa peyama ku dixwest tê de ragihîne kir: "Li Waşokanî ango Serê Kaniyê ne Kurd tenê, Ereb, Aşûrî û Sûryanî jî di nava wekheviyê de dijiyan. Dewleta tirkî yekîtiya neteweyên Serê Kaniyê weke metirsiyekê li ser desthilatdariya xwe didît. Ji ber wê herêm dagîr kir. Min helbestek bi navê Waşokanî nivîsand. Min di vê helbestê de berxwedana şervanan û vegera li warê Mîtaniyan ku wê rojekê rizgar bibe, aniye ziman."

**'Ez hewl didim pirtûka helbestên xwe çap bikim'**

Nalînê bi vê daxwaziyê wiha dawî li gotina xwe anî: "Daxwaziya min ew e ku dema pêş pirtir helbestên xwe pêş bixim. Gava duduyan jî ez hewl didim pirtûka helbestên xwe çap bikim û ez niha jî li ser dixebitim. Gava sisiyan û ya dawî jî ezê dibistana xwe xilas bikim. Paşê biçim Zanîngeha Rojava û beşa tipê yan jî parêzeriyê bixwînim, da civak bikare ji min sûdê bigire."



## Pîrozbayiya salvegera damezirandina Koma Şano ya Qamişlo

***Koma Şano ya Qamişlo bi şanoyekê salvegera 7'an ya damezirandina xwe pîroz kir.***
Pîrozbayî bi beşdarbûna welatiyan û gelek nivîskarên bajarê Qamişlo hat lidarxistin. Rêveber û damezrînerê Koma Şano Ebdurehman Elî di pîrozbayiyê de axivî. Elî behsa xebata komê û jimara endamên wê kir û got, koma Şanoyê di salekê de 3 şanoyan pêşkêş dike, di nava 7 salan de 21 şano pêşkêş kirine. Elî navên hin şanoyan wiha rêz kirin: "Kevirê Mirinê, Keleha Kobanê, Jiyan" û got, jimara endamên komê 40 e. Pişt re şanoyek bi navê "Xizmetgûzarî" hat pêşkêşkirin.

# Cemîl Bayik: Divê ti kes nebe şirîkê qirkirinê -2-

**Hevserokê Konseya Rêveber ya KCK'ê Cemîl Bayik got, divê ti kes nebe şirîkê qirkirinê, xizmeta siyaseta Erdogan û Bahçelî neke û qirkirina gelê Kurd pêş nexe.**

Cemîl Bayik ji bernameya taybet ya Stêrk TV re axivî. Beşa 2. ya hevpeyvîna Cemîl Bayik wiha ye: "Niha mirov balê bikişîne, heyeta Hûlûsî Akar hat Iraqê û başûrê Kurdistanê hevdîtin kirin. Diyar e ku di van hevdîtinan de hin biryar hatine girtin. Eger biryar negirtibûna, plan û proje pêş nexistibûna wê ev axaftin nehatibûna kirin. Diyar e ku bingehekî wê heye. Ev hatina Hûlûsî Akar amadekariya wê ye, zemînê wê amade kir. Bi hevdîtinan ew zemîn çêkirin û li ser wî bingehî tevger dikin, Ji bo wê ew axaftin tên ziman. Dibêjin wê Tirkiye êrişî Şingal, Dêrîk û Herêmên Parastinê yên Medya bik. Tê wê wateyê ku hinekan soz daye û hinek plan pêş xistine. Her kes dizane jixwe li Eyn Îsa ev çend meh in şer heye û Tirkiye dixwaze dagîr bike. Gelê Rojava jî li dijî vê disekine. Ji berî wê jî Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirin. Niha li wê derê Kurdan derdixin çeteyan dixin wan deran, talanan dikin. Yanî dixwazin bi temamî wê derê bixin xizmeta xwe. Dîsa her kes dizane ku dem Tirkiyê êrişî Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Spî kir ENKS jî li cem wan bû. Hê jî ENKS li cem wan e. ENKS hesabê li gel Tirkiyê dike ku Tirkiye cihên din jî dagîr bike. Ji bo ku şoreşa wir tesfiye bike. Wisa hesab dikin ku dema şoreşa wir tesfiye bibe wê li wê derê desthilatiya xwe bimeşînin, di xewnên wisa de ne."

Li ser pêngava azadiya Ocanan jî Bayik wiha got:

Niha pêngava me pêş xistî di nava gelê Kurd de, li tevayiya beşan li derve ji aliyê dostê Kurdan ve şiyarbûnek çêkir. Ruhek di wan de da avakirin. Lê ev ne bes e. Divê ev hê zêdetir bê pêşxistin, hê zêdetir bê xurtkirin. Çima? Lewre xetera li ser gelê Kurd hê bi dawî nebûye pêşî nehatiye girtin. Heta vê dawiyê bi heyeta Hûlûsî Akar, hatina wî ya Bexda



û Hewlêr ev xeter zêdetir kir. Divê bi vê pêngavê pêşiya vê xeterê bi temamî bê girtin, xeter li ser Kurdan nemîne. Ji bo Kurd ji şerê cîhanê yê sisiyan sûdê bigirin û bikarin azadiya xwe bi dest bixe. Lewre imkanên vê hene. Ev pêngav pêngava azdiyê ye. Di navenda wê de azadiya Rêber Apo heye. Pêşxistina Azadiya Rêber Apo ne ji bo azadiya şexsekî ye. Di şexsê Rêber Apo de azadiya gelê Kurd e. Ne li Bakur tenê, li her çar beşan e. Azadiya gelê Rojhilata Navî ye. Azadiya cîhanê yê.

## Ehmê: Divê cihê PDK'ê di nava gelê Kurd de be, ne li rex dewleta tirkî be

Luqman Ehmê: Divê cihê PDK'ê di nava gel de be û cihê pêşmergeyan jî li rex HPG, YPJ û YPG'ê be, ne li rex dewleta tirkî ya dagirker be.

Têkildarê hevakariya PDKê bi dewleta tirkî re, sekerterê Partiya Kesk ya Kurdistanê Luqman Ehmê got; dewleta tirkî her tim hewl dide derbê li destkeftiyên gelê Kurd bixe. Çi li bakur û rojhilatê Sûriyê, çi li Başûr û Şingalê.

**'DEWLETA TIRKÎ DIJMINA SEREKE YA GELÊ KURD E'**

Ehmê da zanîn ku çi sazî yan rêxistin yan jî partiyek navê Kurdî li ser be, yekser dibe armanca dewleta rikî û wiha got: "Ti pêwîstî nîne ku em bibêjin dewleta tirkî dijmina gelê Kurd e yan na, lewre ew dijmina sereke ya gelê Kurd e û ji sed salî ve êrişî Kurdan dike. Çawa gelê Ermen û hin neteweyên din qir kirin, niha jî hewl dide gelê Kurd qir bike."

Ehmê diyar kir ku dewleta tirkî li ser qirkirina gelan hatiye avakirin û her tim li ser erdê gelên resen rûniştiye. Niha jî hewl dide gelên berxwedêr qir bike, di serî de gelê Kurd.

Di vê çarçoveyê de, Ehmê eşkere kir ku sekna PDK'ê li kêleka dewleta tirkî ya dagîrker û planên xwe yên li dijî gelê Kurd nakeve xizmeta gelê Kurd û xizmeta wê û wiha domand: "Ti sedem nînin ku Kurd li kêleka dewleta tirkî ya dagîrker bisekin û êrişî herêmên kurdî yan jî hêzin din bikin. Ev ji bo tevayiya hêzên kurdî xeta sor e."

Ehmê da zanîn ku dem ne dema êrişkirina hêzên kurdî li dijî hêzên kurdî yên din e û wiha pê de çû: "Sûdwarê yekê ji lewazkirina her hêza kurdî, dewleta tirkî ya dagîrker e."

Ehmê hêvî kir ku PDK beşdarî planên dewleta rikrî yên bi armanca pêkanîna nakokî û tevlîheviyê di nava gelê Kurd de, nebe û got, PDK dikare ji binê sîwana dewleta tirkî derkeve."

Ehmê daxuyakirin ku Tevgera Rizgariya Kurdistanê li hemberê planên dewleta tirkî yên bi armanca qirkirina gelê Kurd disekine û bersiva êrişên li dijî başûrê Kurdistanê dide. Eger ev tevger lewaz bibe, wê dewleta tirkî bihêztir bibe. Wê demê bi PDK'ê itiraf nake û bi demê re wê wê hêzê tine bike û PDK'ê vê baş dizane."

Luqman Ehmê got, divê hêz û partiyên kurdî xizmeta dijminê Kurdan nekin, divê hêz û partiyên kurdî di radeya yekê de dijminê



xwe diyar bikin û planên xwe li gorî wê daynin. Li aliyekî din jî divê hêz û partiyên kurdî xebatê ji bo lidarxistina kongreya niştimanî ya kurdî bikin, da ku armanc û rêgezên gelê Kurd diyar bikin û çi êrişên hêzeke kurdî li dijî hêzeke kurdî ya din qedexe bikin.

## "Dewleta tirkî û hikumeta Şamê hewl didin gel li dijî Rêveberiya Xweser derxin"

Hevserokê Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Sîvîl ya Demokratîk ya Minbic û gundewarê wê Mihemed Xêr Şêxo got; gelek alî hene ku dixwazin aramî û ewleyiya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê xerab bikin.

Têkildarê hewldanên sorkirina gel li dijî Rêveberiya Xweser, Hevserokê Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Sîvîl ya Minbic û gundewarê wê Mihemed Xêr Şêxo ji ANHA re wiha axivî: "Li herêmên Rêveberiya Xweser aramî û ewleyî hene û jiyan tê de dibe, ne weke herêmên din yên Sûriyê ne. Bi taybetî piştî ku ceza li Sûriyê hat birin û Qanûna Qeyser dest pê kir."

Mihemed Xêr Şêxo bal kişand ser zehmetiya li pêşiya rêveberiyê derketîn û ev nirxand kir: "Hin alî hene ku dixwazin aramî û ewleyiya herêmê xerab bikin. Lê tevî zehemtiyên ku bi awayekî giştî rastî aboriyê hatin, Rêvberiya Xweser xizmetan pêşkêş dike, girîngiyê dide rewşa jiyanî ya welatiyan."

Mihemed Xêr Şêxo diyar kir ku aramî û ewleyiya li herêmê ne bi dile aliyên derve ye û di serî de dewleta tirkî ya dagîrker û hikûmeta Şamê. Ji ber wê bi dixwazin vê aramiyê têk bibin û tevlîheviyê di navbera pêkhate û neteweyên li herêmê de, derxin."

Mihemed Xêr Şêxo behsa tevlîheviya dawî ya li bajarê Hesekê û Qamişlo derketî kir û wiha got: Komên bi navê "El-Dîfa El-Wetenî" hewl didin rewşê li herêmê tevlîhev bikin. Armanca dewleta tirkî jî dixwaze bi êrişên xwe li herêmên sînor li eniyên bakur û rojavayê Minbicê tevlîheviyê û tirsê di nava welatiyan de derxe.



## Fener



### Gotinên Beloq Fena Vedenga Kundirê Vala Ne!

**Idrîs HENAN**

Di van çend roj û mehên derbasbûyî de gelek pêşketinên ku rûyê hinek lihevkirinên nepenî diyar dikirin rû dan. Rejîma Baas hewl da bi rêbazên Gotta, Qelemûn û taxên rojhilatê Helebê, ambargoyek aborî bavêje ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û herdu taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê. Di serî de Herêma Şehbayê ku li kêleka şêniyên wê bi hezaran koçberên Efrînê lê bi cih dibin hedef girt. Hemû riyên wê qut kirin û li dora herdu taxên Helebê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, jî bendên kontrolê zêde kir. Hemwextî van kiryarên dermirovî, li Hesekê û Qamişlo kete nava provakasyonan. Bi perspektîva parêzgerê bajarê Hesekê, vîna Îranê, lihevkirina nepenî ya istixbarata Tirk û rejîma Sûriyê û bi piştgiriya Rûsyayê dest bi vê konseptê hate kirin. Milîsên Dîfa Elwetenî li Hesekê li dijî vîna gelan dan şixulandin û bi zorê gelê ku kirine koleyê mûçeyan derxistin kolanê. Di vê navberê de cilên sivîl li qiwatên xwe yên leşkerî kirin û gule berdan bendên kontrolê yên hêzên Asayîşê. Li aliyê dîtir dor li Şehbayê şidandin û bi birrîna sotemenî, ard, derman, şîrê zarokan û pêdiviyên jiyanê, xwestin vîna gelê ku sê salan li ser tixûbên bajarê xwe li ber xwe dide dîl bigirin. Li rex wê jî jinên dujanî û kesên bi hewceyî îlaca lezgîn in bi saetan li ser bendên kontrolê yên li dora herdu taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, disekinandin. Di ragihandina xwe de jî digiriyan û digotin ku; qiwatên QSD ambargo avêtiye ser çargoşeyên ewlekariyê yên Hesekê û Qamişlo!

Ewqas rejîmeke xwedî ezmûn e ku dikare rastiyan berovajî bike û bi riya hinek karmendên reşantiyê xwest projeya yekîtiya gelan û jiyana hevbeş li herêmê birûxîne. Wer difikirî ku wê qezenc bike? Ji xwe niyetên xwe venedişartin. Digotin: êdî me hemû cografyaya Sûriyê xistiye bin kontrola xwe, tenî li ber me Bakur û Rojhilatê Sûriyê maye. Diyar bû komployek ku faşîzma Tirk tevî herdu goşeyên dîtir ên Astana li paş perdeya vê konseptê ne. Hêza ku bi salan xwe weke muxalîfê desthilatdariya Esed dide nasîn û li ser qedera gelê Sûriyê bazariyan dike, ji nişkêve veguherî şirîkê rejîma Sûriyê û hemû milîsên rejîmê weke sivîl qaşo da nasîn?

Di helwesta herdu aliyan de, encama lihevkirina istixbaratî ya rejîmên Sûriyê û Tirkiyê diyarker bû. Rejîma ku serokê wê carekê zirt davêtin û digot; ji bilî me ti kesekî li hemberî DAIŞ û Tirkiyê şer nekiriye, îroj qet behsa herêmên hatine dagirkirin nake û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke herêmên dagirkirî bi nav dike?! Eger ne lihavhatin be, mirov dikare çi navekî din lê bike?

Bi lihevkirina destpêkê ya bi navbeyincîtiya Rûsyayê ku têgihaşt êdî nikare li Rojava weke Gotta û Qelemûnê bike, hizirmend û çareserkerên piştî aloziyan jî pir bûn. Ji sekreterên partiyan bigire heya karmendên siyê were. Qaşo hemû jî di lêgerîna lihevhatineke gengaz a di navbera Rêveberiyê û rejîmê de xwe diêşandin. Ewqas xwe diwestandin, projeyên serguha datînan ser maseya rêveberiyê. Lê ti kesekî nediwêrî projeyên xwe pêşkêşî rejîma desthilatdar a ku sedema bingehîn a aliziyê ye bike! Qey Efrînî û Şehbawî ne ji Sûriyê ne û li ser vê xakê multecî ne? Ew ên di armanca mebesta me de, heya niha nediwêrin naveroka plan û lihevkirina rejîmê bi dagirkeriyê re bînin ser ziman! Ne jî xwedî sentezeke rizgariya axa Sûriyê ne. Hêviya xwe ya mezin weşaneke zindî, qebeqeba li ser Facebookê û biriqîna li ber tavê ye.Ancax biryarên neteweyî û welatperweriyê hêz û rêveberiya ku bi hezaran qurbanî dane bigirin. Ji lew re bi LIKE'an çareserî çênabin. Gotinên pir beloq fena vedenga di hundirê kundirê vala de ne.



# 3 sendîkayên Îtalya jî piştgirî dan kampanya 'Ji Ocalan re azadî'

**Sendîkayên Îtalya COBAS, CUB û UNICOBAS jî tevlî kampanya 'Ji Ocalan re azadî' bûn û ji Neteweyên Yekbûyî re name şandin.**

Sendîkayên Îtalya COBAS, CUB û UNICOBAS piştgirî dan kampanya 'Dem hatiye, ji bo Ocalan re azadî, aştî û edalet ji bo Tirkiyê', ya ji aliyê Insiyatîfa 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî' hatî destpêkirin û ji Neteweyên Yekbûyî re name şandin.

Di nameyê de hat bîrxistin ku rêber Abdullah Ocalan 15'ê Sibata 1999'an bi komployeke navneteweyî radestî dewleta tirkî hat kirin û ji hingê ve di nava tecrîdeke giran de ye. Di nameya sendîkayan de wiha hat gotin:

"22 sal derbas bûn û mîna mexdûriyeta hatî serê Nelson Mandela, Abdullah Ocalan di nava şert û mercên nemirovî de tê hiştin. Ocalan riya demokrasî û aştiya li Tirkiye, Sûriye û Rojhilata Navî nîşanî gelê xwe da û ti carî dev ji vê hewldana xwe berneda. Têgihîştina metna 'Konfederalîzma demokratîk' û pêşdîtina wî vê radixe pêş çavan.




Mixabin guh nadin wî, rejima tirkî û Erdoganê dîktator, Tirkiye kirine girtîgeh û leşkergeh. Redkirina mafên mirovî û siyasî, krîza aborî-civakî û xizaniya li qadên bejayî ji aliyê rejima tirkî ya destbixwîn ve tên veşartin.

Di vê dema trajîk de ku korona jiyan li mirovan herimandiye, birçî hiştine, bi taybetî jî mirovên girtî yên bêparastin bandoreke giran li wan kiriye. Li tevayiya cîhanê bi dehhezaran mirov bi daxwazname û kampanya tevlî seferberiya rizgariya Ocalan dibin.

Ji bo aştî û demokrasiya li Tirkiye, Sûriye, Rojhilata Navîn û Rojava heta niha me gelek hewl daye û timî li qadê bûn. Herwiha em piştgiriyê didin kar û bangên ji bo kampanya navneteweyî ya bi navê 'Dem dema wê ye; ji Ocalan re azadî, aştî û edalet ji bo Tirkiyê'."

## YPG û YPJ'ê soza parastina destkeftiyên şehîdan da

YPG û YPJ'ê soza şopandina xeta şehîdan û parastina destekftiyên bi keda şehîdan hatîn bidestxistin dan.

Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ), di çarçoveya civînên li gel malbatên şehîdan de, bi malbatên şehîdan yên bajarê Qamişlo re civiyan.



Civîn li hola Rewabî hat lidarxistin. Hol bi wêneyên şehîdan, alên Meclisa Malbatên Şehîdan, YPG û YPJ'ê hat xemilandin. Li derdora 300 malbatên şehîdan di civînê de amade bûn.

Piştî rêzgirtinê ji fermandarên YPG'ê Mihemed Zêdan axivî û got; serkeftinên me bi dest xistîn, berhemên fikir û felsfeya rêbertiyê ne. Bi saya keda şehîdan me gelek herêm rizgar kirin û destkeftiyên gel parastin."

Di civînê de, Berdevkê Fermî yê YPG'ê Nûrî Mehmûd jî ev nirxandin kir: "Yên canê feda kirîn şehîd in, em jî deyndarên şehîdan e, divê em her tim wan bîr bînin û erkê me ye ku xeta wan ya têkoşînê bidomînin."


Mehmûd da zanîn ku hêza xwe ji malbatên şehîdan digirin, ne ji destek û piştgiriya wan bûya wê nikaribûna serkeftinan pêk bînin û astengiyan rakin.

Ji fermandarên YPJ'ê Roj Devrem jî diyar kir ku şervanên YPJ'ê ji cîhanê re bûne semola berxwedanê. Herwiha da zanîn ku wê şervanên YPJ'ê têkoşîna xwe li hemberî hêzên tarî bidomînin û herêmên dagîrkirî rizgar bikin.

Helbestvan Ferhad Merdê helbest xwendin û li ser şehîdan sinivizyonek hat pêşandan.

Civîn bi stiranên komên TEV-ÇADN bi dawî bû.

## Biden piştgiriya Erebistana Siûdî ya li Yemenê rawestandbi biryardariyeke xurt didome



Serokê Emerîka Joe Biden ragihand ku wê Emerîkak piştgiriya Koalisyona Erebî ya bi pêşengiya Erebistana Siûdî ya li Yemenê rawestîne û got, divê ev şer bi dawî bibe.

Biden di axaftina xwe ya yekê ya li ser siyasta derve de ku li navenda Wezareta Karê Derve ya Washingotinê kiribû got, wê Emerîka piştgiriya xebata Koalisyona Erebî ya bi pêşengiya Erebistana Siûdî ya li Yemenê rawestîne û got, divê ev şer bi dawî bibe.

Biden diyar kir ku wê Emerîka piştgiriya Erebistana Siûdî di parastina serwerî û xaka wê de bidomîne.

Herwiha da zanîn ku wê welatê wî ji bo çareserkirina aloziya Yemenê bixebite.

## HPC: Emê destkeftiyên şoreşê biparêzin

Bi hezaran endamên HPC'ê yên kantona Qamişlo bi meşekê tecrîda li dijî rêber Abdullah Ocalan û gefên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmê şeremzar kirin. Herwiha gotin, emê destkeftiyên şoreşa Rojava biparêzin.

Li dijî tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan û gefên dewleta tikî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi dehhezaran endamên Hêzên Parastina Civakî (HPC) yên Amûdê, Qamişlo, Tirbespiyê, Çilaxa, Rimêlan, Dêrik û Girkê Legê meşek li dar xistin.

Meşê ji deriyê ketina bajarê Dêrikê yê rojava ber bi taxên bajarê Dêrikê ve dest pê kir. Bi hezaran şêniyên Dêrikê ji bo pêşwazîkirina meşvanan, li deriyê ketina bajar kom bûn. Di meşê de durişmên silavkirina



berxwedana rêber Abdullah Ocalan, şermezarkirina gefên dewleta tirkî hatin avêtin. Herwiha wêneyên rêber Abdullah Ocalan û alên HPC'ê hatin hildan.

Meş li Garaca navendî ya Dêrikê rawestiya û veguherî mîtîngê. Hevseroka Meclisa Herêma Dêrikê û endama HPC'ê Zelfa Bidûr axivî, bal kişand ser berxwedana HPC'ê ya li dijî gefên dewleta tirkî.

Mitîng bi tilîliyên dayîkan û durişmên banga azadiya rêber Abdullah Ocalan bi dawî bû

## Divê gel li demokrasiyê xwedî derkeve



**Zekî BEDRAN**

Sûriye, di nava pirsgirikên xwe yên giran de digevize. Rejima Baasê bi piştgiriya Rûsya û Îranê, karî xwe li ser lingê xwe bigire. Lê di rewşa heyî de, Sûrîye bûye sê parçe. Digel vê jî, ji bo çareseriyê ti hewldanên rejimê nînin. Xwestek û niyeta wê ya guhertinê jî nîne. Di hişmendiya wê de, ti nûbûn çênebûne û niyetek wan ya wisa jî nîne. Di hişmendiyê de hinge serê derziyê nûbûn jî nine û li ser tişteke wisa nahizirin jî. Weke berî sala 2010an, dixwazin welat tevê bixin binê kontrola xwe û di binê rêveberiyeke hişk û navendî de bigirin. Li şûna guhertina demokratîk û reforman, parçebûna welat dixwazin. Lê avakirina rêveberiya xweser ya demokratîk ji bo rojhilat û bakurê Sûriyê şansekî mezin e. Di heman demê de ev, ji bo modeleke demokratîk mînakek bû. Li kêleka vê jî xweseriya demokratîk, ji bo yekîtiya Sûriyê şansek bû. Xweseriya demokratîk, karî di nava aştiyê de gelê Erep, Kurd, Sûryan-Asur û gelên din bi hev re bide jiyandin. Di heman demê de amade ne ku bi rêveberiya Şamê re hevpeyvînê bikin û yêkîtiya Sûriyê ava bikin.

Hişmendiya heta niha jî hebûna Kurdan qebul nekirî, wê çawa bikare yêkîtiya Sûriyê çêke? Kesên demokrasî qebul nekirîn, wê çawa bikarin bi fikirên cuda re bijîn? Ev pirsên girîng in. Niha yên li Şamê didanên xwe li Kurdan disîqirînin. Dema di navbera Îran û Iraqê de jî şer derketî Sedam li Helebce komkujî kir. Bi hezaran mirov kuştin. Ji ber ku Kurdan, bi wan re li dijî Îranê şer nekir, wan jî bi wê awayî Kurd ceza kirin û tola xwe wisa ji Kurdan standin. Niha jî rêveberiya Baasê li Sûriyê li hemberî Kurdan di haman hest û fikirê de ye. Dibêjin çawa dibe ku Kurd bê me xwe bi rê ve dibin. Eger Kurdan li hemberî rêveberiya Şamê dijminî bikira, wê niha nikarîbûna li Şamê rûnin. Kurdan rêveberiya Şamê ji herêma xwe dernexist û li hemberî wan şer nekirin. Hikumetê bixwe ew herêm hiştin û çûn. Ji bo ku nekevin binê serweroya çetên DAIŞ`ê û El Nusra, Kurdan jî xwe li hemberî wan bi rêxistin kir û li ber xwe dan. Dewleta tirkî zor da Kurdan ku li hemberî rêveberiya Esed şer bikin. Lê Kurdan qebûl nekir û ji ber wê Kurd li Enqere bûne armanca faşîstan. Van faşîstan jî alîgiriya DAIŞê û çeteyên din dikir. Bi hezaran Erebên koçber û hêzên çeteyan li hemberî rejimê bi çek kirin, bi kar anîn û bi wan re êrişî Kurdan kirin. Dema bi wî awayî encam netirtin, dewlata tirkî bixwe ket nava Sûriyê û dest bi dagîrkirinê kir. Li hemberî Kurdan qirkirina neteweyî dewam dike. Ji ber ku Kurdan li hemberî rêveberiya Şamê şer nekir û rejim li ser lingan ma, dijminiya dewleta tirkî û alîgirên wê li hemberî Kurdan pirtir bû. Dig el vê rastiyê rejima Baasê hewl dide Kurdan tesfiye bike. Ji bo wê jî bi Tirkên faşîst re hevdîtina dikin. Tirk dixwazin Kurd ji holê rabin û nebin xwedî ti statûyan. Rêveberiya Şamê jî haman tiştî difikire. Li ser vê li hemberî Kurdan yêkbûna wan pir hêsan e.

Eger rêveberiya Şamê li ser bingehê demokrasiyê bi Kurdan û herêmên xweser re li hev bike, wê dagîrkerên Tirk û hevkarên wan bi rewabûna xwe winda bikin. Li ser vî bingehî gavên ji bo yêkîtiya Sûriyê bên avêtin, wê bi derdoran re jî baweriyê ava bike û bibe mînakek baş. Wê demê ti kes li gel Tirkan û çeteyan cî nagire. Herwisa hêzên biyanî, wê destê wan qels bibe. Ev jî ji bo ku Sûriyê birînên xwe bipêçe û rabe li ser lingên xwe firsetek e.